# DENGÊ KURD

10 ReŞemê 2712 k 1-3-2013 z DENGê KURD -Hijmar (3) www. Pdksp.com


## Li Mosko Barzanî Rojava yê Kurdistanê Ji Bîra Nekir

## Şoreş û Xwepeşandan Li Yek Hawî

### Şoreşa wêranê

Şoreşe û her şoreşe her kes têde bê tenahîye û sermat û bextreşe ,teqîn û gurmîne,bordûman û bombebarane,guregura firokan li asmane,mirov sergêj ûsersûrmane,avahî têne xwarê û diherifin bi ser serê akinciyên xwe de,li her bajar û li her tax û li her bazarê çîrokên wêranê hatine hûnandin,wêrane û her wêrane ,cengebaziye û her cengebaziye, sitimandina hiş û sewdane. Şoreşa azadiyê hate dagerandin bi bal kînkêşan û tolhildanê ve ,bi berû cengeke qirij û xwînrêj ve,ev ne daxwaz û armancên xwepêşanderan bûn,ev ne hêvî û pêşbîniyên rewşenbîr û çaksazan bûn,ev ne bername yê nûjenxwaz û hizirvanan bû. şoreş ketiye qonaxa cenga hebûnê û ne hebûnê, şoreş pêhate lîstin,gelek matêkirin û dest têwerdan têde çêbûne ji rexê gelek alîgirên nahez û pîlangêr . şoreş ji rêbaza ramyarî derket berê xwe da çolek ber vekirî û bê aso, ew ketiye sitmîkorekî hêvî kuştî û omîd vemirtî û daxwaz palketî, şoreş ji hêl û tora xwenî serbest û nexşekirî dageriya bi berû beyabanek rêtarî bê serûşûn , şoreş ket gêjenên sergêj û çiravên hewqên çong şikestî , şoreşê wêran daye berxwe , bûye şoreşa wêranê ango em di şarstaniya wêranê de ne , şoreşa azadiyê hate belqه tandin , ew buhara ko kelkela çilê havînê bi serde hat ew kuşt û venişt , wax û dax wêrane û her wêrane .

## Rojavayê kurdistanê

## ŞOREŞ û HÊVÎ




2 « Bav û Kalên Me Tiştek Nekirin, Ka Em ê Çibkin

3 « Hawarhatin û Nêzikatî Ya Netewî

3 « Parastin Ji Şerê Navxweyi




# Serok Barzanî Rojavayê Kurdistanê Li Mosko Ji Bîra Nekir



loloxan

Rêvîngiya serok barzani bi berû mosko yê ve di vî heyamî de giringiyeke wînî taybetmend heye ji ber ko kêşedozên nav herêmî zor tevlihevî çêkirine û hêl û torên berjewendiyan pir di hevre derbas bûne , dêmekî hatiye xwestin ko kesayetiyeke xwedî karîzma matêkirinê bike di vê rewş û dirûmê lihevsiwarkirî , da ko girêkûçkan veke û tevna berjewendiyên kurd li rojavayê kurdistanê li darxîne bi kerkîtkekî xurrû kurdewarî . Serok barzanî bi tena xwe dikare kêşedozên rojhilata navîn bigiştî û yên kurdî bi taybetî li gel berpirsiyarên mosko yê ve giftûgo bike û çareseriyan peydabike ji ber ko ew xwedan payenaziyeke dîrokî û siyasî ye , dêmekî ew girêkûçkên di tor û tevna li hev badayî têne verşandin û pevxistin ji nûvde bi destê barzanî , ew kiryara siyasî li ser sê bingeh û rehendên serekî ava dibe , yekem mafên netewî ji gelê kurd re li rojavayê kurdistanê rewadar û pêkhatîne di rojevê de û di pêşbîniya arayê de têne çespandin û bi cihkirin . diwem , pevxistina tevgera kurdî ya rizgarîxwaz li gel dijberiya erebî li sûryayê da ko hev rêzî tekûz bibe û wisa ewê armancên kurd yên netewî bi taybetî û armancên welatparêzî yên sûrî bi giştî tevhev derbasbibin li ser astê berjewendiyên hevbeş tekûz û serrast dibin. Sêyem , kurd yek milete li ser yek xakê dijî û dabeşkirina wî li ser çar dewletên dagîrker sitemkariyke dîrokî ye , divê bête çareserkirin, ev her sê bingeh û rehendên siyasî berjewendiya kurd ya mezin û bilind dixîne çalaksaziya navnetewî bi ser pereştiya serok barzanî .



# Şoreş û xwepêşandan li rojavayê kurdistanê

Perîzad Kîkanî



Serkutkariyên rijêma esd şoreşa sûryayê gûr û gurîx dike û bûyer û qewmanan ser best û ser dest dike , dêmekî wêrana avahiyan û bargiraniya jiyanê ketiye astê man û nemanê . Kurd li rojavayê kurdistanê di xwepêşandanan de berdewamin , wekû tê zanîn li qamişlo hedû taxên serekî rojhilat û rojava ketine xwepêşandanin gûr û gurîx bi amadabûna cemawerekî zor girs û pir ji hemû qatên civakî ve bi bangewaz û hildana dirişmên welatparêzî û dijberî , û wisa ew xwepêşandanên gelêrî derbirrîneke resteqîneye li ser xwestek û armancên kurd ji bona azadiyê û rizgariyê wisa li navçeyeka dîtir li dêrika hemko û li bajarokê girkêlegê gûr û gurîxin û berdewamin , ev xwepêşandan hatine ji bona mukumkirina hevrêziyê di navbera bajar û bajarokan de û dor û berê deverê dijî karûdarên komerîşkên (ypg)ê ewên ko tên bi karanîn dijî hevwelatiyên kurd û belûkirina nerazîbûnê û dakokîkirina rastiya rêbaza barzaniyê nemir di behweriya komelgeha kurdîde li ser rê û rêwaza dirûşmên ko li jor û bala dilerizin. Û li nav çeyeka dîtir li dirbêsiyê xwepêşandaneke gelêrî cemawerî hate bi rêxistin ji bal cemawerên partî u rêbaza barzanî ji bo sipaskirinê ji serokê kurdistanê re bo giringîpêdana wî ji rojavayê kurdistanê re û nexasma hawarhatina wînî jiyarguzeranî wekû ( azoqe – xorak – sotemenî) û wisa durişmên welatparêzî hatin bangvedan li kolanan di gel hildana wêneyên serokê kurdistanê û ornagê kurdayetiyê barzaniyê nemir .

# Bav û kalên me tiştek nekirin,ka emê çibkin

MIHEMED EMiN EREFAT

Gelo heye em li rojavayê kurdistanê bibin yek ,gelo heye zanayên me nekevin xefk û davên dîrokê ,gelo heye em ji şaşiyên berê sûd bigrin , Birastî ev pirsên ha gelekî di hiş û ramanên mide di geren û diserê çi kurdekî ku hest û helwestên kurdayetî di hiş û damarên wîde di gere vê pirsê ji xwe û der dora xwe dike. Dema em biçûk bûn herdem bav û kalên me digotin; bav û bapîran tiştek ji mere nekirin jiber ez ezîtî , êl, û eşîrtî,ji ber ku ne xwende bûn , hovên çol û çiya bûn , herdem em qels bûn, bê maf û winda dijîn . ev bedbextiya xwe têxistin stiwê wan , lê dema îro çima em vê derfeta dîrokî ji xwere qezenc nakin û em xwe dûrî şaşiyên bav û kala nakin çima dijminê me wek rojên berê me di xapîne, gelo raste em tê nagihin yan em berjewendiyên kesatî yan partîtî di parêzin, Ger bav û kalên me hovbin , çima zariwên xwendevan jiwan hovtirin , û ji şaşiyên berê sûdê wrnagirin . birastî ev nêrîneke gelek tenge em têre di bûrin, û divê nerînê de serokên partiyan berpirsiyarên yekemînin di vê qunaxêde, û paşê gelê kurd bi tevayî ber pirsiyare div î warî de, çimkî ev welat neyê hêzekê yan partîkê ye lê yê gelê kurd bi tevayî ye, û pirsa herî giring milet wê çi bike, û wê çawa karibe serkirdayetiya vê qunaxê bike,her kes dizane ku serokên partiyên me bi şêweyekî gelemperî li dûv berjewendiyên kesayetî dikevin , û bila em şaş nebin û bêjin ew doza berjewendiyên partiyên xwe dikin , jiber ku berjewendiyên partiyên wan bana wê derfet bidana kesne din da serweriya vê partyê yan ya din bikin , da partiyên pêş bêxin , lê ew berjewndiyên xwe yên kesayetî di parêzin ,li vêdê rola milet ewe ku karibe mafê xwe yê xwiristî biparêze , û bibe jimareke giran di rewşa siyasî de,lê aloziya herî giring ewe ku milet bi gelemperî ne azade di hiş û ramanên xwede ,ewjî parçeke ji rojhilata navîne, yê ku hîn ezezîtî, êl,û eşîrtî roleke girinig têde di lîze ,vê gavê rola rewşen bîr û nivîskarên kurd dest pê dike , ji wan tê xwestin ku karibin wa kesên hîn mij û dûman liser cavên wane wê mij û dûmanê rakin, ne tenê kesên serbixwe lê bitaybetî ew kesên di partiya dene , da karibin roleke mestir bidin encûmena niştimanî kurdî ,jib o ku karibe bi rola xwe ya taybet li gor vê qunaxê bi lîze, ji her kurdekî xwedan wijdan tê xwestin bi hemû hest û helwestên xwe bi hemû vîna ku didilê wan de ye karbikin ji vê encûmenê re ,û wê kesayetiya partîtî rakin ji holê,û dîse dibêjim dive em li gelê xwe xwedî derkevin ,û ev xwedîtî bi kar û xebata bê rawestan têt , da nifşên ku piştî me bên tif nekin gora me , û çawa em tavêjin bav û kalên xwe wê zarokên me jî bavêjin me ,û di nerîna mide encûmen divê roleke mestir bilîze ,û karibe serkirdayetiya kurdan bike divê dêmêde , û kesên ser bixwe karekî mestir têde bicih bînin . û hevalên partiya bandoreke giran li partiyên xwe bikin ,ji bo ewî giraniya xwe bidin encûmenê , da di wê gavê de encûmen bi rola serkirdayetî bilîze,ev derfetek dîrokiye , divê em karibin ji xwere qezenc bikin. û yekîtiya kurda bi yekîtiya nivîskarên wêye , dema ew bandorê li partiya bikin da bibin yek , û herdem nivîsên wan bo vî karîbin. Û bibin stêr di ezmanê kudewariyê de, di nerîna mide ku yekitiya nivîskarên kurd çêbibe wê bibe bingeh bo yekîtiya hişê kurdayetiyê, û yekîtiya partiyên kurd jî çêbibe , yekîtiya miletê kurd li rojavayê kurdistanê wê bibe tişteke ber çav, û nema dimîne xewin, û nifşên bên nebêjin bav û kalan tiştek ji mere nekir , û dijmin di gola berxwedana miletê kurde were gevzandin.

# Rojava û başûrê kurdistanê

## (hawarhatin û nêzîkatiya netewî)

Şêrzad Osman



Şoreşa sûriyayê û encam û derpêdanên wênî tengezarî di hemû war û deravan de hişt ko rojava û başûrê kurdistanê têkelî û şengistên mervantîyê mukum û tekûzbikin. Alîkariyên hawar hatinê ji bal barzanî ve damarê jiyanê pevxist û rêxist û bû dergehekî netewî ko serok barzani karibe kêşedoza kurd li rojavayê kurdistanê bilivîne û destkariyê têde bike ji bo berjewendiyên gelê kurd biparêze . Du rehendên serekî hene di kiryara alîkariyên hawarhatinê de , yekem rehendê mirovatiyê , ev dide xuyanê ko rojava ketiye qeyraneke tengezar û jiyareke bihinçikiyayî , dêmekî alîkariyên xorak û sotemeniyê tên pesedkirin û pejirandin ji hemû alîgiran çi naxoyî û çi navherêmî . diwem , rehendê siyasî , çiqasî em bibêjin û nebêjin di nava ewî rehendi mirovatî de rehendekî siyasî serêxwe hildide , dêmekî razîbûna gelê kurd li rojavayê kurdistanê ji serok barzanî pejrandinek siyasî û netewî tê pêkanîn , lewra evê hawarhatinê rolekî xwenî netewî lîstiye di mukumkirina şengist û peywendiyan de di navbera gelê kurd de li başûr û rojavayê kurdistanê û wilo ancam û serancamên kurdayetiyê serrast dibin.

# Rojavayê kurdistanê dinavbera şoreş û hêviyan de

Laleş Waşokanî




Dilrastiyek heye ku rojavayê kurdistanê lipêşiya derfeteke dîrokî rawestiyaye ji bo pêkanîna hêvî û pêşbîniyên xwenî netewî, paşî serdemin dûr û dirêj ji bêparbûn û ladan û ji paşguhkirinê . Bizava şoreşgêrane dide xuynê ko qazanckerê herî mezin ji şoreşa sûriyayê pekhatê kurd de , ji berko hêminî u tenahiyê herêma kurdî girtiye û gelê kurd rewşa ewlekariyê xistiyê bin zeftûmest a xwe di ser ko kawdanên abûrî zor tengavî û tengezarî peydakirine di jiyarguzeranê de . Ev wênelanê siyasî û jiyarguzeranî tûşî çendîn metirsiyan dibe ji ber ko ew girêdayî ye bi çeranûsê şoreşê û pekhatên dîtir ve û bi rehendê navherêmî ve wekû turkiya ji ber ko turkiya naxweze tenahî xwe berde ser herêma rojavayê kurdistanê da ko kurd neghêjin mebest û armancên xwenî netewî . Rojavayê kurdistanê li himberî çendîn rêkaşiyan rawestiya ye , yek ji wan nakokiyên navxoyî û pevxistina yekbûneke rêkxistinî , ya diwem nakokî digel dijberiya erebî û ne li hevkirin li ser zaravsazî û xwstekên pêkhatê kurd li sûrya yê , ya sêyem metirsiyên nav herêmî u desttêwerdana turkiya asteng û nakokiyan kûr û dijwar dike , dêmekî kurd ber pirsiyarin ko berjewendiyên partîzanî biçemînin li himberî berjewendiyên welatparêzî

# Kurd dê çawa xwe ji şerê navxweyî biparêzin

Mistefa Minle

Erê pirsa herî girîng û rojane div ê şoreşa sûrî de xwe ferzî ser xelk û aemawerê me yê Kurdistana rojava kiriye, bûye pirsgirêk û guftûgoya her dem û çax bi şev û roj li ser tê sekinandin û şirovekirin, û bûye cihê balkêşiya hemû welatparêz û hêzên tevgera Kurdî ya demoqrat û aştîxwaz di nav civaka Kurdên Sûriyê de. Vêca durist e ku em ji xwe bipirsin çima ev tirs û saw heye ji şerê navxwe div ê bibe û mumkîne di rojên werin de çê bibe û bi teqe û ziyaneke mezin bigihêne gelê me bi tevahî, tevî em bawer in dijminê Kurdan ne ji îroj de li ser lîstok û kêndiran dilîzin ji zû de ev pêlanên qirêj û kirêt bikar tînin jib o şerê birakujiyê di nav me de her dem hebe û berdewame. Eve jî ne cara yekê di nav me Kurdan de çêdibe, lewre em dûr neçin di sala 1995an de, li Kurdistana başûr şerê navxweyî bûye, û dû re şerê di navbera hukumeta herêma Kurdistanê û çekdarên P.K.K de çêbûye, divî warî de divê em tim sûc û stubariyê nexin û navêjin ser xelkê hinek sûc di qirika me de ye, ji ber wê hin tevgerên me ne aqildar û heyînî ne, û xwe bi dijmin ve girêdidin, û pirojeyên dijmin li Kurdistanê dimeşînin, û dibin destik di nav lepên



wan de. Gelo ma emê heya kengî bindest û ketxwar bin eger ev hişên me bin dijmên me Kurdan ên çawa bin, lewre di encama peyvên min de div ê têkliyên tevger û partiyê me di çarçewyên dî de li Kurdistanê ne li ser hesab û berjewendiyên wî perçî bin ango firotina perçakî biçûk jib o perçakî mezin be, ev siyaseteke çewt e û xiniz e, ne jibo me Kurdan e û divêt emhişyar bin û zanibin, li hember van pêlanan li sere me Kurdan tên ajotin , tê xwastin em siyaset û têkliyên xwe li gor berjewendiyên netewa Kurd û Kurdistanê bînin û biparêzin, divê em baş nas bikin ku dewletên mezin çawa diponijin û siyasetê pêktînin li rojhilata navîn û eynî wê dimîne Kurd ka emê çawa pê re bidin û bistînin û siyasetê pê re bikin. Li dawiya dawî de divê em wek rêz û tevger û partî em nekevin hevbendiyên diwelî yên herêmî yên tê naskirin ku ew di pêşerojê de yê werin rûxandin û ti cihên dîktetorîyetê namîne di rojhilata navîn de.

www.arsivakurdi.org

# Lîska kiboxanan tê Pêşankirin li hesekê

Koma(roslîn) li hesekê şanogeriya (lîska kiboxanan) pêşan kir li nivîsgeha encûmena niştimanî ya kurdî,ev şanogerî hate pêşan kirin li ser du pêlwazan ji bo ko derfet bête danîn ji ev şanogrî gelektirîn kes re da ko pêşankariyê bi bînin , babetê evê şanogeriyê li ser ramana xweser û kiboxanan û berdestkên wan di gere û liser şêwzên ziyangihndina wan ji xelkêre û tunnekirina wan û li ser nîhadê zindî ewê ko hîna licem gelek kesan mayeû xwe bi rîbîran vegirtine, ev şanogerî bi şêweykî nûjensazî hate pêşan kirin (amûr û alavên ronahiyê û dengsaziyê hatin têde pêk anîn) rêkariya şadîkan gelekî ciwan û karîgerbû, cemawer bi wan re tev hel kar bû , li dawiya şanogeriyê cemawer bi çepik lêdanê pêşan karî û şadîk xelatkirin. Tê zanîn ko koma (roslîn) htiya damezrandin li sala 2008 li hasakê bi dahatiyên xomalî , evê koma şanokar pênc şanogerî pêşkêş kirine heya nûka ew ji evin (mar – erkê nertewî – dîmokratiya silo) û (hîrostrat ji bîra bikin) ji wergerandin û berhevkirina : lolo xan . Ev her pênc şano gerî tevde li amûdê jî hatine pêşankirin li (navenda reşîd kurd) û li gundê (sofiya) . Koma roslîn nûka rahênanê dike li ser şanogeriyeka dîtir bi navê (raweste tu tazeye) û di demeke nêzîk de ewê bête pêşankirin li bajarên kurdî .





Ciwan Miranî

# Simfonîyeka xuristî

Va rojana simfonîyeka li dare
Lê bê heste û bê denge
Zimanê wê pirtûkeke kevne
Lêderê saza wê
Pehlewanekî dildare
Tirajîdya rojên berê
Her evebû
Keval li ber keval bû
Rengaw û reng bû
Vêca lêdew lêde wa dildaro
Me digot xuristîye
Ji pirtûka zaravan
Her tişt ranewestya û ranewestya
Ta ku agirê dilê min û yê te
Di gel pêlên volkana têkelbûn
Vêca lêdewa lêde wa dîrokvano
Dê meb kuje û me nehêle
Da ku awazên vîna me
Nefirin li gel xewnên zarokên sava
Vêca lêdew lêde wa lêdero
Wax bavo…
Li me dîsa bû şev
Kuştin awadêt bira
Rondikan xwe dît li ser
Dêmên xûşk û dayikan
Dil xwe reşkir!!
Li ber şûxa zerya
( kurdistana şeyda )
Vêca ka dengê simfonî ya me


# Melek (letîfa) derxist
## bi herdû zimanên kurdî û inglîzî


Sitranbêja kurd melek şûkrî bi hevkariya komeka lawên ( pna) lihanover li 23 reşmehê kilîpa letîfa derxist ji ecans û radiyoya peyamnêr re got : ji zûde min dest bi kilîpkirina sitranên kurdî kiriye bi terz û şêwazên nûjenî cîhanî û wisa got : sitrana letîfa karê minî herî dawî ye û bi hevkariya rênas mîran hetiye sazkirin û li bajarê hamborg hatiya wênekirin . Melek şûkrî dibêje : her hunermend boçonek wînî taybet heye , ez dibînim ko filiklorê kurdî bi şêwazekî cîhanî derkeve çêtire da ko mendehoşiyekê li seranserî cîhanê ve de. Melek dibîni ko parastin û bêşbirina hunerê kurdî li ser binyadeke ciwan û tekûz ferwere û vêtwere da ko filiklorê kurdî çêj û tameke xwenî taybet hebe û wisa wê zindîbe di her dû rehendên serekîde ( resenayetî – nûjenayetî ) da ko li paş nemîne .



# Etlesa Dîrokî a Tevgera Rizgarîxwaza Kurdistan Belav Bû

Berga yekemîn ji Etlesê Dîrokiya Tevgerên Rizgarîxwazên Kurdistan, bi dû beşên cûda û li dû pirtûkan de bi qebareya mezin hatin çapkirin. Beşa yekemîn ji vê Etlesê, ``Tevgera Barzan heta sala 1945 radixe û jêderên xwe disperse çendîn belgename, nexşe, wêne û kesayet û di 126 rûpelan de. behsa tevgera ji sala 1945 heta şoreşa Êylûlê 1961, dike, ev jî bi heman şêwaza hatiye çapkirin. Beşa dûyemîna vê etlesî beşa yekem nêrînên xwe disperse çendîn belge, wêne û nexşe û kesayetiyên pispor û ji 130 rûpelan pêktê. Ev piroje ji Serdar Mihemed Ebdulrehman û Hoşiyar Mihemed Emîn ve hatiye amadekirin û li bajarê Hewlêrê çap bûye.





# Servedarî û xelatkirin

Komeleya cûdî berdewame li ser kar û xebata xwenî netewperwerî bo pêşxistina civaka kurdî bi berû çêtirîn ast û paygeh di warê hînbûn û zanîn û rewşenbîriyê de rabû bi xelatkirina gulbijêrek ji xwendekarên servedar di xwendegeha qamişlo de li hijdê vê mehê . Ahengê dest bi sirûda kurdî ntewî kir û paş re serkarê xwendegehê peyvtarek xwend têde dilxweşî ya xwe der birrî li ser çalakiyên komeleya cûdî û buhêrtarek li dîroka damezrandina yekîtiya xwendekarên kurdistanê pêşkêş kir . û li dûv re d. caber ebdullah peyvtara komeleyê xwend û têde tekes kir li ser hevgirtina karûkoşişên xwendekar û xizmên wî û kargêriya saydayetiyê di çêkirina kiryara ser ve dariyê û amaje kir bi berû jiyanaziyê ve û peyvtara xwe bi dawî anî li ser hilvedana giringiya servedariyê bo zorbirinê li ser azarkêşana jiyara kesûkarê kurd li sûriyayê , û paş re çendek ji şagirdan pêşankariyên filiklorî pêşkêşkirin û dûv re xelat hatin dabeşkirin li ser sed xwendekarên ser vedar ji bal komeleya cûdî ve . û li dûmahîkê çalakiyên ahengê hatin serrastkirinbi çend sitranên dilşadî da ko şahî dilên zarokan bigre di ser azarkêşana wan ve .

